

Kurdisch (Kurmandschi)

Bi hev re li dijî Koronayê – Tîmê vaksîndanê yê gerhok li Leipzigê

Vaksîndan bêy civan, yekser li taxa te

Şehirdariya Bajarê Leipzigê û Xaça Sor ya Elmanî (DRK) û kompaniya taybet Leipzig/Engelsdorf (KEE) dixwazin di çarçoveya projeyeke hevbeş de, derfeta derzîlêdana vaksîna Koronayê ji bo mirovên li taxên corbecor yên bajarê Leipzigê siviktir bikin.

Tu jî tevî bibe! Tu jî ji 22.07.2021ê ve derziya vaksînê li xwe bide. Xwe û malbata xwe û mirovên hawîrdora xwe ji derencamên paşinde yên nexweşiya Kovîd-19 biaprêze.

Rûpelê:
1 ji 2

Kengî û li ku derê vaksîndan pêk tê?


Vaksîna yekem: 22.07. – 18.08.2021

Vaksîna duyem: 12.08. – 08.09.2021

Bêy civan!

Cihên vaksîndanê

- Anger-Crottendorf
- Gohlis
- Grünau
- Paunsdorf
- Reudnitz
- Stötteritz
- Volkmarsdorf / Neustadt-Neuschönefeld
- Zentrum-West



Tu dikarî cih û demên vaksîndanê bi dirustî li ser vê malpera înternête peyda bikî:

www.impfung-leipzig.de.

Divê ez ji bo vaksîndanê çi belgeyan bi xwe re bînim?

- Belgeyên şexsî (Nasname, Pasport, Nasnameya şexsî)
- Karta tamîna tendirustî
- Deftera vaksîndanê
- Û belgeyên din, heger hebin, wek mînak deftera dil, deftera nexweşiya şekir yan lîsteyeke dermanan

Tenê heger te ev belge hebin:

- Pirsnameya qebûlkirinê û nexweşiyên ya tendirustî û tijekirî li ser vaksîndana parastinê ji Kovîd-19
- Belgeya zaniyariyên hişyarî li ser vaksîndana parastinê ji Kovîd-19

Tu dikarî wê pirsnameya zaniyariyên hişyarî li ser vaksîndanê û hem pirsnameya li ser nexweşiyên bi gelek zimanan li înternêta li ser malpera enstîtûta Robert-Koch (RKI) yan li ser vê malperê peyda bikî: www.impfung-leipzig.de.

Tu dikarî wan herdu belgeyan li cihê vaksîndanê jî ji aliyê tîmê me yê vaksîndanê yê gerhok werbigirî.

Çi derziyên vaksîndanê têne danîn?

Rûpelê:
2 ji 2

Ew derziya vaksîne ya qebûlkirî ya mRNA „Comirnaty“ ya kompaniya BioNTech/Pfizer û derziya vaksîne ya qebûlkirî ya Vektor „COVID-19 Vaccine Janssen“ ya kompaniya Johnson & Johnson li mirovan didin.

Agahdariyên berferetir li ser derziyên vaksîne di wan belgeyên pêzanînên hişyarî yê enstîtûta Robert-Koch (RKI) de hene. Karmendên beşê tendirustî yê pispore û her wiha bijîk û doktorên li wan cihên derzîlêdanê wê bi dilxweşî û bi bîhna fereh her tiştî jî te re bêjin û şîrove bikin û bersiva pirsên te li ser vaksîna parastina li dijî Koronayê bidin.

Gelo li ku derê agahdariyên berferetir li ser xizmetên tîmê vaksîndanê yê gerhok hene?

Tu dikarî agahdariyan li ser cih û demên dirust yê wan cihên vaksîndanê û her wiha agahdariyên rojane li ser xizmetên tîmê vaksîndanê yê gerhok li ser vê malpera înternêta peyda bikî: www.impfung-leipzig.de.



TELEFÛNA AGAHIYAN

Xizmetên vaksîndanê yê gerhok li Leipzigê

0800 0 161 161

bi sirryet û bê pere

www.impfung-leipzig.de

